



K.T.

Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê

Enstituya Zimanên Zindî Yên li Tirkîyê

Şaxa Zanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

LATÎNÎZEKIRINA
“MERSÎYENAMEYA ÎMAM HUSEYÎN”
A MELA MIHEMMED NÛREDDÎN

(Ji beyta 283yan heta beyta 679an)

Zelal KAÇAN

15721098

Şêwirmend

Hayrullah ACAR

Mêrdîn 2017

K.T.

Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê
Enstituya Zimanên Zindî Yên li Tirkîyê
Şaxa Zanista Ziman û Çanda Kurdî
Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

LATÎNÎZEKIRINA
‘MERSÎYENAMEYA ÎMAM HUSEYÎN’
A MELA MIHEMMED NÛREDDÎN

(Ji beyta 283yan heta beyta 679an)

Zelal KAÇAN
15721090

Şêwirmend
Hayrullah ACAR

Mêrdîn 2017

NAVEROK

KURTE	2
ÖZET	2
PÊŞGOTIN	3

BEŞA YEKEM

1. Jiyan Ê Berhemên Mela Mihemmed Nûreddîn.....	4
---	---

BEŞA DUYEM

1. Latînîzekirina ‘’Mersîyenameya Îmam Huseyîn’’ A Mela Mihemmed Nûreddîn (Ji beyta 283yan heta beyta 679an).....	6
2. Ferhengoka Berhemê.....	43
3. Metna Destxet ya Berhemê.....	45
4. Çavkanî.....	74

KURTE

Di vê xebatê de Mersiyenameya Îmam Huseyn a Mela Mihemmed Nûreddîn hatiye latînîzekirin. Her beyt ji bo xebatên pêşerojê hêsan bibe hatine numarekirin. Di dawiya metnê de ferhengokek jî hatiye amadekirin.

Bêjeyên Sereke: Îmam Huseyn, Mersîyename, Mela Mihemmed Nûreddîn, Latînîzekirin

ÖZET

Bu çalışmada Mela Mihemmed Nûreddîn tarafından yazılan İmam Hüseyin Mersiyesi adlı metin latinize edilmiştir. Sonraki çalışmalarda kolaylık sağlması adına her beyit numaralandırılmıştır. Metnin sonunda küçük bir sözlük de hazırlanmıştır.

Anahtar Kelimeler: İmam Hüseyin, mersiyyename, Mela Mihemmed Nûreddîn, latinize

PÊŞGOTÎN

Di vê xebatê de Mersiyenameya Îmamê Huseyn a Mihemmed Mela Nûreddîn hatiye latînîzekirin. Ev metîn bi tîpên Erebî di sala 1974an de hatiye nivîsandin. Armanc ev e ku ev metîn ji bo xebatên Kurdî wek çavkanî be û di lêkolînan de hêsantir bibe hatiye latînîzekirin.

Bi vê xebatê ev metîn hatiye latînîzekirin û di dawî wê de jî ferhengokek hatiye amadekirin. Ji bo amadekirina ferhengokê jî, ji ferhengên Kurdî-Osmanî-Erebî-Farisî hatiye bikaranîn.

Di latînîzekirinê de peyv li gorî harekeyê û devoka nivîskar hatiye nivîsandin. Piştî ev peyv li gorî weznê hatiye sererastkirin. Di amadekirinê de her beyt ji bo k udi pêşerojê de ji bo xebatan lêkolîn hêsan bibe, hatiye numarekirin.

Di vê xebatê de şewirmendê me yê hêja Hayrullah ACAR bi rêberiya xwe û di hîlbijartina projeyê de bi alîkariya xwe riya me vekir. Ji bo vê alîkariyê ez şewirmendê me Hayrullah ACAR re spas dikim. Di dawîyê de ji bo alîkarî û piştgiriya wan ez ji mamoste Abdulselam YILMAZ û Menci TEKÎN re spas dikim

Zelal KAÇAN

Mêrdîn 2017

BEŞA YEKEM

1. JIYAN Û BERHEMÊN MELA MIHEMMED NÛREDDÎN
2. MERSIYENAMEYA DI DERHEQÊ ŞEHADETA ÎMAM HUSEYN
DAYE RADIYELLAHU TEALA ANHU

Tarîxa Jîna Seydayê Mele Mihemmed Nûreddîn

Seyda bi neseba xwe Seyyid yanî ewladê Resulê kurrê Mele Ebdullah kurrê Mele Elî kurê Mele Ebdullah ji gundê Mîrza Began e. Seyda di tarîxa 1310 rûmî de li gundê Sînanê hate dinyayê. Senan gundekî li rojavayê Batmanê dikeve. Bi qederê pênc kîlometran jê dûr e. Seyda li Senanê el Medîna Diyarbekir Medresa Camiya Husrev Paşa Elî Pinarê, Ma'denî cîrrî güzel, şêxê cîrzî, Dêrika Çîyayê Mazî xwendîye. Seyda gelek kitêbên bi wezn çêkirine. Lewra ta2biat mevzun bû. Yek miracê ye bi navê "Kîtabu'l Îsra- Welmîrac" sed û sih û heyşt (138) rûpel e. Ya duduyan kitêba nasîhet û şîreta ye bi navê "Nezhetu'l-Nufûs" e. Ya sisiyan "Durrel-Yetim" ev kitêb wunda ye. Ancax perçekî jê ya bi benda çardehan (14) ku derheqê Mersiya Hazretî Huseyn da ye di destê me de heye. Ev jî vêga em vê mersiye digel Nuzhetü'l Mecalîs çap dikin. Înşa'allah te'ala ya çaran dîwan e. Sed û bîst (120) rûpel e. Bi weznek selîs û fesîh hatiye nezmkirin. Ya pêncan kitêbek fiqhê ye li ser mezheba Îmam Şafi'î telîf kiriye. Seyda purê emre xwe bi tedrisat, dîrsa fiqihan û di muta'ala kitêban derbas kiriye. Seyda li weysîkanê jêrîn li alê Şemerê Kurdê Omeran ser qeluwî dûr e Şerê 'enşae Hecî Îsê îmametî kiriye. Lê belê li gundê Hecî Îsê bi qedrê pêncî salan îmametî kiriye li Hecî Îsê wefat kiriye. Tarîxa wefata wî di 22ê Gulanê 1977) mîladî de bû. Seydayê Mele Mihemmed Nûreddîn li hinda quba Seyfu'l-Muluk bi qederê heft mitroyan li rojavayê qubê medfûn e. Seyfu'l Muluk ziyaretgehek meşhûr e. Li ser Keviya Çemê Dicle ye. Pênc kilometre ji gundê Hecî Îsê dûr e. Bi teref qibla wî de ye. Rehma Xwedê zaf li ser mekanê seyda bit. Û cennetu'l firdews cih û meskenê wî bit. Amîn!. Ev kitêba bi izna kurê seyda Mele Mehdî ku vêga li gundê Hecî Îsê îmam e. Înşa'allah em çap dikin. Xwedayê Te'ala li dinya û axretê wî mes'ûd bike. Me û wî tevan ji fitne

û mûsîbetê axir zeman muhafaza bike . Ji ber vê izna wî ez pur û pur ji Mele
Mehdî re spas dikim. Selameta din û dunya wî ji rebbê 'alemê daxwazî dikim.

Zeynelabidîn Amedî

13 Cemaziyel-axir 1425 Hicrî

31 Temmuz 2004 Mîladî

BEŞA DUYEM

1. LATÎNÎZEKIRINA ‘MERSÎYENAMEYA ÎMAM HUSEYÎN’’ A MELA MIHEMMED NÛREDDÎN (JI BEYTA 283YAN HETA BEYTA 679AN)

BISMÎLLAHÎRRAHMANÎRREHÎM

MULA’ENE

1. Hezar ah û efxan dikim her seher
Rica’ dikim ez ji fexru’l beşer
2. Dibêjim tu negre li min şehriyar
Ku la’net li ser wan bikim bê qerar
3. Bi’edda hemî qatreî ma ‘î sema
Bi’edda hemî hemû derd û xema
4. Bi seqlê cîbal û bi ew zanê eb
Bi’edda cemî`ê hurûfê kîtab
5. Bi’edda hemî sî dar kê’inat
Çi ret bû çi yebîs we hem hedrewat
6. Dibêjim îlahî bi’edda melek
Çi qasî hebitin melek der felek
7. Bi’edda hemî ehlê her heşt cinan
Bi’edda ne’îmê ewan cumle şan
8. Bi’edda hemî ehlê dûzexê kerîm
Çiqa di dibînin ezabê elîm

9. Bidi la'netê ser Şemer hem sînan
Çawan wan şehîd kir îmamê ciwan
10. Çû şeytan bidi ser wan la'netê
Di dûzex bibînin ebed zehmetê
11. Tu daxil bike bin zîyad û 'Ûmer
Di vî la'netê da dinerî seqer
12. Nikarim ebed la'netê ser Yezîd
Bikim ez ditirsim ji xill û hedîd
13. Ku têkêvinê dest û payê di min
Nikarim hilînim 'ezaba mezin
14. Çira çunkî kes nîn e şahid ebed
Li ser wî xebîsê bi muhr û sened
15. Ku gotî Ji bo kes ebed bal delîl
Here tu qetil ke Huseynê celîl
16. We hem wî bi destê xû qet'en tu car
Nekuştî ewî sebtî pakê kubar
17. Ji lew ez nikarim bidim ser Yezîd
Evî la'netî ser xebîsê belîd
18. Welê kin dibêjim îlahî eman
Bide ser Yezîd 'ezab giran
19. Hezaran zeman û hezar hîn û gav
Di nar-i cehennem bibê kanî av

20. Mûza'af bibit av 'ezabê elîm
Di nar-i cehennem bibit dil seqîm
21. Xelase peyabûn hemî bi hewes
Dihat pêş Huseyn Sînan bin Enes
22. Qet' kir serê wî îmamê kubar
Heman wî hilanî bi lez bû suwar
23. Beraber fikir wan bira'sê şerîf
Riûsê sehabê delalê 'effî
24. Rû's ewan ser rîmahê tîwal
Dixistin heman ew dibûn kerr û lal
25. Li ser wan dibû tarî sî roj tamam
Nikari bi pêş de biçit yek zilam
26. Heta bû tamam her sê rojê kubar
Di ber wan serê wî şahê namdar
27. Li 'eynê sînan bir serê şahê zad
Heta ba Ebdullah ibn'î Zîyad
28. Çi hîna wazî' kir wî reîsê şerîf
Dîgotî rîkabam tijî ki ji zîv
29. Çiku seyîdek min ji ehlê hîcaz
Dikuştî bide min tu zîvê beyaz
30. Rîkabam tijî ki ji zêr ey emîr
Ji yaqût û elmas bide min kesîr

31. Qeteltû Huseynên bizane ji min
Kî biz'ek ji wî şahê însan û cin
32. Ew e seyîdê ehlê perdê yeqîn
Wiha bû rîwayet ji şahê emîn
33. Di ser wî da kes nîn e qet bê neseb
Ne rûm û ne turk û ne Kurd û 'ereb
34. Gerek tu bidî min gelek bêqeder
Ji zîv û ji elmas û ji yaqût û zêr
35. Bi derhal ezab girtî wî hanê han
Ji tefrîta qewlê le'înê Sînan
36. Digoî kîwellaî wellah ehed
Ne zêr û ne zîvek qe nadim ebed
37. Eger tu dizani wiha bû Huseyn
Çi ra kuştina wî te kir şubhê deyn
38. E jî te qetil kim çû kelbê mîrar
Ji bo wan kalamê te yî bê şûmar
39. Xelase ewî zend hilanî ji dil
Bi derhal Sînanê Enes kir qetil
40. Li ser yek mûnadî emir kir bixar
Bira cemi bin cihê biçûk û kubar
41. Hemî cemi bûn nik ubeydê şeqî
Bi wan da nîşan reîsê şahê neqî

42. Bi dest xwe digirt yek qedîb an zeman
Dida ser diranê Huseyn el-eman
43. Di niqurand ewî çendî car bê edeb
Ne tirsê ji wî şahê fexrê ‘ereb
44. Heman zeydê erqem digotî helî
Ji ser wan diranê Huseynê Elî
45. Katibê xwe ye kafirê dînê betal
Nizani ev e ew Huseynê delal
46. Bi çavê serê xwe min dî çendê car
Ji şahê ‘ereb dîtina pir kubar
47. Ewî her du li vê munevver ji nûr
Dida ser diranê Huseynê sabur
48. Ne Fîra’ûn û şeddad û bo cahilê pîs
Ebed wan nekir wek tefê’lê xebîs
49. Hilîne kâtibe (kazibê) xwe tu hanê han
Bitirse ji wî şah û fexrê cîhan
50. Li dû wî kirin kir girînek eceb
Digotî eya qewm û tuxmê ‘ereb
51. Di piştî kuştina vî şahê ba ‘ereb
Ne cah û ne rutbe dimîne ebed
52. Ji bo we eya ehlê Kûfa yeqîn
Huseyn bû dibiz’ek ji şahê emîn

53. Li nik we diniqrîne kelbê eqûr
Li ser wan diranê Huseynê bi nûr
54. Çawan hûn qebûl dikin bill tamam
Ji ibn' Zîyad ev qeder întîqam
55. Eger mûmînin hûn bi şahê kerîm
Werin wî qetil kin çû kelbê zemîn
56. Bi ceddê Huseyn wî qeti' kin ji dil
Nehêlin hilîne ebed yek ricil
57. Xelase kes gûh nekir ev meqal
Dibêji temaman dibûn kerr û lal
58. Cewab baş kesê qet neda der husûr
Ku belkî temamen ji wî kir nufûr
59. Bi derhal li wî îltîfat kir 'Ubeyd
Bi çavê xedeb hem bi kîn û bi keyd
60. Digoî kîwellahî ya îxtîyar
Seqet te xeber da bi lafizê kubar
61. Eger îxtîyarê nebûna yeqîn
Min ê ser hilîna ji canê şêrîn
62. Xeref te eya Zeydê Erqem 'elen
Dixwazi ji min kin evan so'zan
63. Mebe ber dile xwe evan cumlê şan
Bibîne ji min tu cihê xaxî giran

64. Tu derkev ji vê mehfela pir kubar
Ku hêja serê te heçûyî bêxar
65. Wegerne qeti'kim serê te bi lez
Di vê mehfelê da kî yê bêje ez
66. Here ya îbn Erqem here bêhenek
Ji min vê meqalê neke reyb û şek
67. Ne fezle xeber da ji xwe zêdetir
Bi cuz te kî ye min bike munkedir
68. Here tu şukur ke bi şukrê cezîl
Weger ne muheqqeq dikim te qetîl
69. Bi lez rabû çû der kurê Erqemî
Ji bo wan digotî bizanin hemî
70. Di piştî niha hûn 'abîdin tamam
Gelek hûn bibînin ji wan întîqam
71. We anî mezin kir Ubeyd û Yezîd
Li ser şah Huseynê heta bû şehîd
72. Xelase gelî ummeta pur şeqî
Di piştî şahê Kerbela'î teqî
73. Nebêjin ku em mûmînîn ba yeqîn
Şafi'ê me ye Seyîd-ul Murselîn
74. Ku belkî Yezîd û 'Ubeydê şenî'
Di yewmil qiyame Ji bo we şefî'

75. Nîhayet serê şah Huseynê îmam
Digel van ri'ûsê Xudan îhtîram
76. Birin wan heta şehre Şamê bi lez
Bi rê da dikir wan gelek sa'û bez
77. Mûhafiz li ser wan dibêjin zecir
Yekî pîsê murdarê sahîb-xedir
78. Beraber bi wan re heta şehre Şam
Ebed bo kesî qet nekir îhtîram
79. Xelase di Şamê duxûl bû zecir
Heta bû duhûl wî dikir pir xedir
80. Heta hate ba wî Yezîdê mirar
Digel şî'a û ehlê beyta kubar
81. Heman gotî bi wî Yezîd ma werak
Bi lez tu Ji bo min bibî merdî şak
82. Bide min cewabek ji alê Huseyn
Serî'en dizwazim ji te şubhê dîn
83. Were hey were ey zecir hanê han
Fesîhen bibêje çi ye der cîhan
84. Ji min tu xefî qet meke ey Resûl
Bi sidq û sefa tu bîni bêfidûl
85. Çi ye tu bibêje Ji bo min bi lez
Dibînim gel te bûye cerge bez

86. Mufessel bibêje bike eşkera
Li min tu xefî qet neke der sera
87. Cewab da kî mizgîn li te ey emîr
Di dervê cîhanê nebî dil kesîr
88. Wurûd bû li ser me Huseynê 'Elî
Bi hey'ed bi zînet çû şemsa celî
89. Beraber kirî hujda merdê kubar
Welî şî'a wî bizan şêst û car
90. Fesîrna îlahim bi emrê emîr
Me gotî Ji bo wî eya dil xatîr
91. Were tu nizûl be bi hukmê me da
Dixwazin ji te tu bikî wî eda
92. Weyaxûd eger tu bixwazi qîtal
Li ser vî firatê wesî'e mecal
93. Qîtal wî hilanî yekîn û bi kerb
Dixwest wî bikuştâ bite'n û bi derb
94. Me anî qetil kir Huseyn û sehab
Di erdê 'Iraqê dibûn wek kebab
95. Serê wan me anî li wir man cesed
Ji bo wan di dunya nebû qet medet
96. Beraber bi mîza nîsa û benîn
Bizane ji min terk esîrên yeqîn

97. Beraber ‘Elî Huseyn ji dil
Di dest û pîyê wî yê bizan qeyd û xil
98. Bi cuzyek tifeylê kî nemeş ‘Umer
Hefîdê hezebrê Xuda pir henin
99. Xelase esîrin li nik te tamam
Nikarin xeberdin ebed der meqam
100. Li dû van meqalê zecir bêxîlaf
Ji çeşmî Yezîdê dihat qetrê av
101. Digoî kîwellah bi zatê celal
Eger min bidîta di weqta qîtal
102. Min dehişt wî bikra bi wî ra xedir
Here der ji vê meclîsê ey zecir
103. Rîza min nîn e bi qetla Huseyn
Heta kuştina wî we kir şubhê dîn
104. Here ey zecir tu ji vê der bixar
Te dunya li min kir gelek teng û tar
105. Li ser bin Zîyad la’ neta zulcelal
Çawan wî şehîd kir Huseynê delal
106. Heman ibn’ Qeys çûye der sefirbet
Ji destê Yezîd nedi qet medet
107. Ku îlla ewî la’ netek pir ezîm
Dibir wî Ji bo xwe bi qelbek seqîm

108. Bi lez çû heta hate Kûfa yeqîn
Yeka yek digo bo Ubeydê le'în
109. Hemî gotinê wî Yezîdê mirar
Cemî'en arz kir li wî kelbê har
110. Nîhayet serê şahê deşta 'Iraq
Bi lez wan dixûl kir bi terz û lîyaq
111. Heta wan biri ber Yezîdê xebîs
Ewî ra'sê ha pir efîf û nefîs
112. Bi destê Yezîd hebû yek qedîb
Dida ser diranê Huseynê lebîb
113. Gelek beyt û eş'ar digotin rezil
Ebed ew netirse ji şahê celîl
114. Ebû Burdetî eslemî der 'eqeb
Digotî hilî tu qedîb bê edeb
115. Ji ser wan diranê 'ezîzê bi nûr
Bitirse ji rebbê kerîmê xefûr
116. Nizani ev e seyyîdê heşt cîhan
Wiha bû rîwayet ji fexrê cîhan
117. Bi lez rabû çû der ewî eslamî
Ji bo wan digotî bizanin hemî
118. Nebêjin ku em mûmînin bill tamam
Şefa'et bibînin ji ceddê îmam

119. Xelase gelî ummeta eşqîya
Hasîm we ye seyyîdê esfîya
120. Nexasim eger Fatîme merzîyye
Di yewmul qîyame bikit gaziye
121. Ku ya'nî bira bên huzûra Xuda
Ku de em yeka yek ji hev bên cuda
122. Cewaba wan dim çî ye der hizûr
Eger ehlê beytê bikin pir nifûr
123. Nizanin di dunya û di hem der qîyam
Eger ne Muhemmed Eleyhîssalam
124. Bibit rehberî me temamen ji dil
Di ewwel di axir dibin em xecil

MEVDÛ'U TEDERRÛ'Ê WEL ÎBTÎHAL

125. Îlahî bikî rehberê min emîn
Mi dûr kî ji vê firqeya muznubîn
126. Eger çî şefa'et me pir kir bedîd
Ricaê dikim min efû kî mecîd
127. Çî ku ez muhîbbim bi beyta Resûl
Eger çî dibêjim kelimê fuzûl
128. Bi qelb û bi dil ez muhîbbim eman
Ji bo ehlê beyta şahê îns û can
129. Çawa ne muhîbbim bi qelbê şewat
Şefî'ê me ye şahê Alî sifat

130. Li ser me ji ferzane ey girdê gar
Ku em hesab kin ehlê beyta kubar
131. Çi ku te ji mahza edem ba yeqîn
Me çi kir Ji bo şahê beyta zemîn
132. Li me lazime hubbê fexrê ‘ereb
Di ber wî ebed em nekin bê edeb
133. Nexasim bi ber ehlê beyta hebîb
Gerek em nehêlin bibin dil kebîb
134. Gelo wî çawa kin ‘Ubeyd û Yezîd
Ji destê şahê Kerbela’ê wehîd
135. Nizanim eger ev fexrê ne felek
Bibore ji wan ew bi rahma gelek
136. Çi ku rahmetek pir mezin bo heye
Dirêje li ser wî kesî hewce ye
137. Ji wan xwe çêtir min nedî der cîhan
Ji bo rahmeta wî şahê îns û can
138. E jî hewce me ey şahê bawefa
Birêje li ser min eya Mustefa
139. Tu rahma xwe ye pir bi cuda ‘emîm
Min nespêra nefsa min î pir zemîn
140. Eger çi gunehkar û pir zillet im
Welê kin gunehkarê ev ummet im

141. Mi pir kirne isyan hezaran sunûf
Ji enva'î qebîh bizan sed ûlûf
142. Şefaet bikî nûriyî bimedat
Mehêle di orta guneh da tu car
143. Boyna Hesên ba Huseyn şehîd
Bibûra ji neclê cinûnê belîd
144. Eger tu neborî ji wî ey nebî
Kî ye tê bibore ji xecel xebî
145. Eya fexrê 'alem bi zat û sifat
Qesem ez dixwim te bi roja memat
146. Mûhîbbim bi te her dem û sa'etê
Gerek tu mî'adekî ji vê ummetê
147. Gelek ez feqîr im bi cah û rûteb
Dexîlim li ber babê fexrê 'ereb
148. Bibore ji vê nûrîyê dil' bikul
Bide ber wî tu rahî ehed subûl
149. Eger çe bin pakî û bed fîa'l
Dibîni şefaet bikî der mal
150. Veger nehezîn im di sal û zeman
Ditirsim nebînim şahê ruh û can
151. Çi ku ez dizanim bav rûsîya
Nikarim ku bim hezreta kîbrîya

152. Ne şerm û heya bo te ey zenbîdar
Şeb û roj dikî van zinûbê kubar
153. Nizani demek hewce ye şahê dîn
Dibi necîl ew hed eya dilbirîn
154. Xu bavêje dergaha wî subh û şam
Ku belkî şefaet bikit der qîyam
155. Bike zare zar tu dem û sa'etê
Rica xwe bike ez şahê ummetê
156. Bibêje eya sedirê Elî hemîm
Ewî neclê ew hed bi êş û elem
157. Mehêle di bahra gunahê xebîs
Eya şahê dînê mûbînê nefîs
158. Şefa'et bike qismetê min hebîb
Bibora ji wî mucrîme dil kebîb
159. Nîhayet şefa'et dixwazim yeqîn
Me derxî ji nîv firqeya muznîbîn
160. Bi cuz babê te ez nikarim ebed
Biçim ber derê heçê kes bê meded
- SEWQA PÊŞÎ**
161. Were necil ew hed tu bes izdirab
Bine te dil û sîne kir wek kebab
162. Tu meqsed bikêşe li me nehn û fî
Beyan ke li me tu meke qed xeffî

163. Birije heraret ji qelb û ceger
Eya nûrîy şafi'y bê mefer
164. Mûfessel bike sewqê pêşî rewan
Di bahsa serîyê wî Huseynê zeman
165. Çawan bû di wexta birin mahfelê
Bi diqqet beyan ke tu vê welwelê
166. Na'am gotî nûrê Ji bo sa'îlê
Were îstîma'ke bi qelb û dile
167. Çi wexta birin ba Yezîdê pelîd
Serê wî şahê Kerbal'ê wehîd
168. Setir wî fikir ev serê namîdar
Ji ehl û ji ewladê şahê kubar
169. Sekîne digel Fatîme zîcemal
Bi derhal didîtin şahê ba kemal
170. Gelek wan kirin kir girînek eceb
Nedîte çû kes ev girîn der 'ereb
171. Heta hate der cumle ehlê Yezîd
Ji bo kerb û vê hesreta pir şedîd
172. Gelek welwele wan fikir der meqam
Çû kes qet nema bû di niv şehre Şam
173. Ku îlla ewan ma'temek pir mezin
Dikir bo hefidê şahê îns û cin

174. Febilhemdî gotin gelo der cîhan
Tu kafir hene wek Yezîd bê eman
175. Benatê Resûlê Xuda kir esîr
Çawan wî xelas be di roja esîr
176. Emir kir bibin wan bi alê herîm
Nehêlin ebed ew bibin dil seqîn
177. Li dû wî emir kir ku bînin ‘Elîy
Hefîdê Elîy Welî Celîy
178. Bi derhal dihûl bû Elî an zeman
Di dest û pîyê wî quyûdê giran
179. Heta hate ba wî bi derd û bi êş
Nikari biçit ez quyûdanê bi pêş
180. Digoî kî wellah ey dil xedar
Eger min bidîta Resûlê kubar
181. Di vê haletê da bi qeyd û bi xil
Gelek ew Ji bo min dibû dilbikul
182. Welê kin gelek zan dikim ey Yezîd
Te qelb û dile xwe kirî wek hedîd
183. Li ser ehlê beytê bi xed û ji kîn
Heta te hılanîn hemî ecma’în
184. Te nezerek mezin kir şeb û roj û an
Heta fûrsatê tu bibîni heman

185. Ji bo ehlê beytê qetil ki hemî
Eya ehle narî seqer pir xemî
186. Tedarik bike xwe Ji bo narê kûr
Tu dûrî ji rahma Xudayê bê qusûr
187. Çawan min dihêli di xillê giran
Nizane ez im ehlê şahê cîhan
188. Na'am gotibû wî û tesdîq kir
Vekin qeyd û xillê Elîy emrê kir
189. We hem wî balî xwe bir wî demê
Nehîştî bibîni ebed yek xemê
190. Ji bo ra gelek merheba go ji dil
Tu derxe ji qelb û dilêt xişş û xil
191. Qesem pir dixwim ez bi zatê celal
Me agah nebû qet bi cerb û qîtal
192. Heta wî Ubeydê le'înê cehûl
Dişandî zecir wî xebîsê Resûl
193. Ebed min nizani Huseyn bû şehîd
Bû ceza wî şeqî le'înê şedîd
194. Le'înê Ubeyd pir cîhan teng û tar
Li min kir bi qetla Huseynê kubar
195. Welê kin gelek min dixwestî ji wî
Di hukmê mi da pir bimeşya qewî

196. Çi re çunkî wî qet ebed îhtîram
Nekir wî Ji bo min bi qest û meram
197. Taarruz fikir wî di hukmê mi da
Dixwestî temaman ji min bin cuda
198. Ne qedr û ne ma' rîfetek wî ebed
Nekir wî Ji bo min bi mihr û sened
199. Eger wî bikirna Ji bo min qedir
Çi re wî bihata serê ev xedir
200. Çi hate serê wî bizane yeqîn
Ji dest û ji zebanî wî hat ecma'în
201. Cewab da Elîy bo Yezîd der 'eqeb
Ne fezle xeber da eya bê edeb
202. Nizani çî bêtin di nefis û zemîn
Kîtabet Xuda kir di levh mûbîn
203. Berê xilqeta alemê biltemam
Xuda ku muhyî bû eleyhîsselam
204. Çi ku ev yesîra li nik girdîyar
Mebêje evan gotinê bê şûmar
205. Ku de hûn te'essuf nekin yek nefes
Di hukmê Xuda da nebin hûn eses
206. Daxwaz û 'etaê Xudayê kerîm
Mebin cangiran hûn bi qelbê selîm

207. Hulasa qeti'kir Eliy ev kelam
Ji ber giryê mahfela der meqam
208. Nikari xeber de ji derdê mezin
Ku çi bû ji ehlê şahê îns û cin
209. Li dû wî emir kir ku yek menzelek
Mûheyra bikin bo şahê çavbelek
210. Digel wan herîmê şahê Kerbela
Mehêlin ezîyet bibînîn 'ala
211. Di ecra lehûm kullema yunfîqûn
Li ser ev mûsîbet dibûn sabirûn
212. Welê ev Yezîdê bi kerb û bi kîn
Muheqqeq bi cuz zîyneta abidîn
213. Nexwarî tu xwarin şeb û roj û an
Ji bo kes nekit nefretê der cîhan
214. Bizan rojekî gazî kir bo xeda
Dixwestî wezîfa bikêtin eda
215. Di gel xo bire wî birayê 'Umer
Sexîrê delalê bi fedl û hüner
216. Ji bona Yezîdê hebû yek weled
Mûsemma bi Xalid ev i bê meded
217. Bi umr û qiyafet wekî ev bizan
Ne kêr û ne zêde ebed yek ji wan

218. Heman der 'eqeb go Yezîd bo Umer
Were tu rewan be bi fezl û hüner
219. Eger tu dikari bikî tu qîtal
Bi Xalid ra ey Umerê çavxezal
220. Werin hûn di vir da bikin ceng û herb
Li hev din gelek hûn bi ta'n û bi derb
221. Cewab da Umer bo Yezîdê pelîd
Bide min sekînek waliy pir şedîd
222. Bide Xalidê xo sekînek kubar
Çawan meclîsê lê bikim teng û tar
223. Ku de tu nebêji ebed der cîhan
Nemaye çû kes bû şahê îns û can
224. Nizani eger yek tufîkek saxîr
Bimîne ji ehlê beşîrê nezîr
225. Bi sed qat ji wa zêdetir ey Yezîd
Fetih tu meke vê derê bê kilîd
226. Yezîd wî bi sînga xu ve zemm kir
Li nav her du burhê wî teqbîl kir
227. Li dû wî digotî sedeq te Umer
Ji van gotin te hemî ser te ser
228. Dizanim hewîye ji heyyê kubar
Dibit şînsîna ez ezel hate xwar

229. Weba' dû li Nu'man emir kir Yezîd
Xwe bijdîne ya ibn'e beşer pir şedîd
230. Bişîne balî Medîne bi lez
Bi ehlê nebira bi say' û bi bez
231. Zilamek emîn tu bişîn el-ecel
Emanet bike danebit pir xelet
232. Li dû wî weda' kir Elîy bin Huseyn
Gelek wî rica jê dikir şubhê dîn
233. Wehem wî rica jê dikir bê hîsab
Dexîlim li ber babê Elîy cenab
234. Kîwellah ege mi nîn e ebed
Di qetla îmamê bi muhr û sened
235. Welê kin çî hîna diçi nîv herem
Tu deyne li erda muqeddes qedem
236. Kî ka te bine ey bi du'aya tahîra
Ji bo te bişênim gelek faxira
237. Çî noqsan bibit ez hewaic eman
Nivîsandeke tu dî wext û zeman
238. Nîhayet çî qas la'netê girdigar
Li ser bin Zîyad bin delîl û nehar
239. Mudaxîl me nîn e di ehle nebîy
Bi xeyr wî Ubeydê şeqîyê xebîy

240. Tecasur kirî wî bi fê'lê kubar
Bi qetla Huseyn cîhan kird tar
241. Bi erş û bi ferşê Xwedayê kerîm
Bi cah û bi qedrê Resûlê ezîm
242. Ne ilm û ne agah ebed min nebû
Di qetla Huseyn da cîhan berze hbû
243. Çi zahir çi batin çi leyl û nehar
Dinûşim şeraba firaqa kubar
244. Welê kin çi bêjim te bawer nîye
Ji eqsam û sûndê me pir xwarîye
245. Eger çi xerabim meke tu 'elen
Ji min ev qeder ya Elîy so' zan
246. Nîhayet xuda kir muqedder welî
Ji wexta ezel ser Huseynê 'Elî
247. Gerek tu sebir kî bi sebra cemîl
Li ser ev musîbet bibî tu delîl
248. Weba'û weda'kir Elîy der eqeb
Diçû ew bi sa'y û bi lez roj û şeb
249. Heta bû dihûl der Medîne bi lez
Ebed wî yê bi rê da nekir carga bez
250. Bi lez Fatîme ez sekîne sûal
Dikir wî bî fedl û huner ba kemal

251. Digoî eya uhtê min ev recûl
Nehište bi rê da bibin dil bikul
252. Ku ya'nî hafîzê me ez şehre Şam
Gelek wî heta vir dîkir îhtîram
253. Gelo wî çi be ger tu tişte mezî
Bidi wî Ji bo şahê însan û cin
254. Çi ku ev recûl hurmetek bê qeder
Ji bo me birêda dîkir bê keder
255. Were tu bidi ger dîxwaze ji dil
Bi dil xweş wî rêke meke wî xecil
256. Cewab da sekîne cewabek kubar
Dixwazim bidim di melc û hem suwar
257. Bîxeylê qe nakim bi tişte ebed
Ji bo wî hefîzê bi muhr û sened
258. Xulase sekîne ji destê şerîf
Der anîye cotek sîwarê letîf
259. Emir kir li ser Fatîme zîcema
Were tu bişîne sîwarê bêxal
260. Balî hefîzê me ê ba edeb
Ewan hedye û hem sîwarê Heleb
261. Na'm gote bo wê Fatîma hazîn
Dişande Ji bona hafîzê emîn

262. Welê kin digel di melcê pir kubar
Dişandî Ji bona hafîz yadîgar
263. Nîhayet heta çû gihişte hefîz
Zilamê emîn ne fazz û xalîz
264. Vegerandî cumle hedîyan tamam
Digote bi cahê Resûlê ‘enam
265. Qebûl qe nakim ewan cumleyan
Eger xizmetê kim hezaran zeman
266. Çê ku min Ji bona Xuda hem Resûl
Kire ev sonî’a çawa nekim qebûl
267. Eger rexbetek min di dunya’a dîn
Hebûna min î pur bixwesta dufûn
268. Welê kin me raxbet heye der qîyam
Kî ceddê we derbaz bikit me tamam
269. Me da rahîme alemê ba yeqîn
Li ser ceddê we seyyîdul-murselîn
270. Reçaê dikim ez ji we bêguman
Ji ber hûn nekin min di wext û zeman
271. Weba’ dû weda’kir ji wan ecma’în
Heta hate ba wî Yezîdê kemîn
272. Arz kir hemî fi’êl û ef’alê qenc
Ne kerb û ezîyet ne ta’ab û ne renc

273. Nîhayet ku bû gotinê wî tamam
Li nik wî Yezîdê şaqî wesselam
274. Ditirse gelek ev Yezîdê mirar
Ji ber ehlê beytê dibû teng û tar
275. Çi ku ew bi fikra xwe ya qasir e
Dizane bi vî itreta tahir e
276. Çi hîna sema'kin hadîsa şewat
Ku çê bû li ser şatt û nehrê firat
277. Ebed lahzayek bo şahê Kerbela
Xu tehîr nakin bi hayy û hela
278. Bi şeb ta seher wî ebed xwe nekir
Ji ber ehlê beytê dibû munkedir
279. Ne hurt û ne xwarin şeb û roj û an
Ji tirsê şahîşahê axirzeman
280. Xulase ewî xaînê bê wefa
Gelek rûsîyahe ji ber Mistefa
281. Xîtam bû di durre'l yetîm serteser
Bi cahê Mûhemmed Resûlê beşer
282. Di sal hezar û we sê sed yeqîn
Ku borî ji tarîx şahê emîn
283. Digel pêncih be sal edîdê diraz
Mezani ji hicra re'îsê Hîcaz

284. We hem pênc sene çû bila reyb û şek
Mufessel me go ev qeder bê henek
285. We hem der cemazî duwan bû tamam
Li ser ruhê Ehmed salat û selam
286. Bizan çarde rojê mubarek heman
Dibûrê ji meha cemazî duwan
287. Di saetê carê ji rojê selas
Xitam bû di durre'l yetîm bê meras

MEWDA'EL-TEDARRUH-WEL ÎBTÎHAL

288. Xuda ye bo mina şahê Kerbela
Bi cahê Hesen bi sebtê şahê ula
289. Bi qedrê Elî zîyneta abidîn
Munîxê di nîv fîrçeya muznubîn
290. Eger mucrîmek pir xedar im Xuda
Bidî xatirê şahê reh-i huda
291. Çi ku ez dinalim şeb û roj û an
Ji kerba ku dîtî Huseynê zeman
292. Li ser vê firatê mubarek temîz
Şehîd bû Îmamê wehîdê ezîz
293. Çawan ta'n kir kafirê rûsîya
Bi qest û bikin ev sere eşqîya

294. Li sebtê hebîb efxerê ne felek
Şebabê cînanê şahê çavbelek
295. Dema tî te fikr û xeyala nuceyl
Dibaz ji çeşm û basar xûn çû sey
296. Welê kin çi bêjim Xuda ez ezel
Wiha pê emir kir kema fil-ecel
297. Ji lew ez nikarim xeberdim yeqîn
Di vê meselê da eya dûrebîn
298. Wegerna li ser vê nuceylê xebîy
Gelek lazim e bû hefidê nebîy
299. Çi xur dixwarin heram ke ebed
Binale ji cergr û kebed bê eded
300. Bibêje Huseyna Huseynê zeman
Tuyî qurretê eynê şahê cîhan
301. Şefa'at bike nûrîy pê bê medar
Mehêle di orta guna de tu car
302. Huseyna bi reîs bi çeşmê belek
Bi ceddê te yê e fexrê neh felek
303. Ewan çendê elfazê şêrîn zerîn
Me anîne nezmê bi qelbê hezîn
304. Ji ber hubbê te bide'ê tahire
Me tenzîmê kir ev qeder zahire

305. Çi ku ummeta seyyîdê îns û cin
Gelek jê nizanin bi qetla mezin
306. Me anî beyan ku ev Kerbela
Cihê meqtela şah Huseyna ala
307. Ji bo ew bizanin şehîd bû Huseyn
Ku da ma'tem ew bikin şibhê dîn
308. Muhherrem dema deh biborin tamam
Bikin ma'tem cumleye xas û 'am
309. Bibêjin hewar e hewar e hewar
Werin ma'temê bo şahê namdar
310. Şehîd bû di ev qurretê eynê pak
Di erdê Iraqê li ser rûyê xak
311. Neba bû neda hem ne qeym û bira
Şehîd bû di reyhaneyê heşt sera
312. Îlahî bi reyhana cennete
Tu nûrê nehêli di nîv zahmete
313. Eger çi xerab e bibore ji wî
Bide xatirê Mustefayê xuyî
314. Ji ca da hebîbê xwe yi nazdar
Megire bire wî Xudaye tu car
315. Hefîz ke ji ehwalê yewmîl qîyam
Bi cahê Mûhemmed eleyhîssalam

316. Çi ku serxwûş û bê derûne reqîb
Ji ehwal û îhtar roja ecîb
317. Dizanim di yewmîl qîyam da û bab
Nikarin xelas kin ewî bi sewab
318. Ku îlla şehîn şahê beyt û hatîm
Şefaet bikit vê nucûlê seqîn
319. Ne ilm û emel min ne ahdek weşîq
Rica'ê dikim ez ji şahê haqîq
320. Bibit rehberê min di yewmîn nişûr
Eger çi gunehkarim û zû qusûr
321. Bide xatirê şahê deşta Iraq
Nucûlê xebî mud nefî dil mezaq
322. Me çend beyt anî wezin bê futûr
Ji bahsa şahê Kerbelayê vaqûr
323. Xweş e bê nivîsanda ser barek gul
Ewan çendê beytê razîn bi kul
324. Bixwînit li ser 'and lib hezîn
Bi eşq û heraret bi ah û anîn
325. Welîy xur û wîldanê vê dewhê
Binalin binalin bi vê name'
326. Temaman bi hev ra bibin ey qedîr
Bi xefrê gunahê nucila feqîr

327. Çi ku ew bi beyt û bi şî'îra xefî
Dinale di wesfê şehîde wefî
328. Illehî ewî mudnîf dil xedar
Bibexşê şahê Kerbelayê kubar
329. Me soze dilê wî bi nara elîm
Xuda ye bi cahê Resûlê ezîm
330. Nikarit li ser narê dûzêha heman
Bikişit ezîyyet eman sed eman
331. Eger çi xerab e ji nîv ummetê
Nede ber wî ya reb ebed zahmete
332. Bibore ji wî tu bi rahma giran
Birêje li ser tu 'eta'ê rewan
333. Ewî neclê ew hed feqîrê feqîr
Bibexşê Mûhemmed beşîrê nezîr
334. Ewan çendî rojê edîdê edîd
Gelek surh dem wî dibari şedîd
335. Heraret ji qelb û ciger tê te der
Bi ah û bi nalîn disoze beşer
336. Bide xatirê beyt û şî'irê temîz
Ku telfîq kir çend rojê ezîz
337. Ewî mudnîfê bê sikun û medar
Bi xeylê xebîyê haşîfê mirar

338. Eger ne ji hubba şahê dilbirîn
Me tanzîm nedikir çû beyte metîn
339. Gelek min vexwarî bi dil surx-dem
Bi ta'b û ezîyyet bi êş û elem
340. Dizanim ku yek mutir bi der cîhan
Biçit ber derê hekîmê ev zeman
341. Bi sûza dil û sîn û cerg û hinav
Wekî vê bûxeylê xebî hîn û gav
342. Bixwaze ji wî dîrhemek bi henek
Ne zêde ne kê m mutribê nay tek
343. Didî ser serê ev emîrê celîl
Musemma xu nake bi navê bexîl
344. Temaşa ji zatê cemîlul sîfat
Ku derbaz nekit min duyunul memat
345. Bi keyf û surûr bi zewq û sefa
Ebed ev li nik min qe nabit hefî
346. Dizanim ku rahma Xudayê qedîr
Kesîr e kesîr e kesîr e kesîr
347. Nexasim li ser mucrîme bê newa
Wekî min di la'b û di leh û hewa
348. Eger ev Xudayê 'azîm û metîn
Ku rahme birêje li ser muznebîn

349. Îhate dîkit cumle' wan tamam
Ebed yek li ber fewtê nabit heman
350. Heta ev ezâzîlê melûnê har
Rica' dîkit bo wî noqtak kubar
351. Çawan bê umîd ez bibim ey ehed
Ji vê rahmeta bê hîsab û eded
352. Ku madem şeytanê pîsê muzirr
Dixwazit yekî nuqte ez rahmê pîrr
353. Digel ev xeber pîstîrê kâinat
Dixwazit bi rahma Xuda bit necat
354. Çi qasî xerabim welî bendeyem
Li ber dergehê rahmetê tu le yem
355. Ne la'îq dibînîm eya girdî gar
Ku derbaz nekî min ji narê kubar
356. Eger rûsiyahim bizanîb giran
Bide xatîrê şahê axîrzeman
357. Çi ku ez dibînîm gelek mu'teber
Nebiyê elemdarê cumle beşer
358. Li nik te eya xaliqê îns û cin
Bi xefrê ji min van gunahê mezin
359. Eger tu ne xefrê bûxeylê seqîm
Dizani şahê rukn û beyt û hetîm

360. Ebed razî nabit bi ta'zîb min
Ku îlla bi xefrê gunahê di min
361. Çi gote wehî kir li ser şahê dîn
Ku razî dikim te mebe dil hezîn
362. Çawan ew dibe şadiman ey Xuda
Ji zumra Mûhemmed bibim ez cuda
363. Were necil ew hed were û sîya
Ji heddê xu ji zêde meçe bê heya
364. Te derbazî kir çendî carê 'edîd
Dizanbû guna da di emrê şedîd
365. Ne qûwwet ne taqet Ji bo te ebed
Di vê mes'elê da bi muhr û sened
366. Çi ra nû te'errûz dikî bê edeb
Xu bavêje dergeha şahê 'ereb
367. Ku belkî şefa'et bikit te ji dil
Nehêle di yewmîl qîyamê bê xecil
368. Çi ku rehberê cumle 'alem bizan
Mûhemmed şahên şahê axirê zeman
369. Bi Adem bi Îdrîs û Nûhê nebî
Bi xefrê Xudayê bûxeylê xebî
370. Bê Hûd û bê Salih Îbrahîm Xelîl
Îsma'îl û Lûtê nebîyyê celîl

371. Bi Îshaq û Yê'qûbê sahib-xatir
Bi Yûnûs bi Eyyûbê sahib zerar
372. Şû'eyb û bi Mûsa bi Harûnê ub
Mûhakî ji min wan bihara zunûb
373. Bi Dawûd Suleyman û Zîlkîfl ypak
Me rusua neke rebbê ser rûyê xak
374. Bi Îlyas û Elyse'ê pakê delal
Bi Yûsûf Xudawendî sahib cemal
375. Zekerya bi Yahya bi Îsa mesîh
Mûhemmed Resûlê fesîh
376. Bibûra ji min tu bi van efzalan
Hilîne ji ser min zinûbê giran
377. Cesaret mekir der cîhanê xerab
Me borî bi lez umrekî bê sewab
378. Bi xeflet hemî çû ne fikr û xiyal
Ebed min nekir bo şahê layezal
379. Eger min bikirna xiyal û fikir
Çira der cîhanê dibûm munkedir
380. Welê kin şahê Kerbela bê henek
Şeffî'ê min e ew bila reyb û şek
381. Çi ra çunkî min çendî rojê edîd
Di ber wî dixwar sûrx-demê şedîd

382. Ne mexfî li nik min şehîdê Iraq
Ku derbaz nekit min bi terz û liyaq
383. Çi ku ba'zekî tahire bê xîlaf
Ruh û can fîda bin Ji bo roj û gav
384. Were tu qet'i ke bûxeylê xebî
Nizani ev e ew hefîde nebî
385. Eger ew te derbas nekit zînhar
Bi van beyt û eş'arê şêrîn kubar
386. Kî ye îltîfat bikit ey sehîf
Digel te bûxeylê feqîrê za'îf
387. Were bes dirêj ke tu benda dua
Bike hemd û şukr û sena' Xuda
388. Bibêje îlahî ez im bê edeb
Bibûra ji min tu bi fexrê 'ereb
389. Yedî xwe dirêj ke bi bal girdîgar
Bi diqqet du'a ke di leyl û nehar
390. Bibêje Xuda ye Xudayê xeffar
Bi xefrînê min mucrime dil xedar
391. Digel da û bab û we her çar bira
Di der vê cîhanê Ji bo min çira
392. Digel qewm û itba' û exwalê hem
Xuda ye nede wan ebed hem û xem

393. Bi xefrîn kesê ku bixûne ji dil
Di vê meclîsê da bîla xîş û xil
394. Bike hediye ew fatihêk bi tamam
Ji bo min feqîrê hezîn wesselam
395. Digel yek salat û selamê qedir
Bide ser Resûlê ‘ezîm û fexir
396. Xuda der qîyam wî bike şadiman
Bi cahê Mûhemmed şahê îns û can
397. Îlahî efû ke min û da û bab
Di heşrê hilîne sere min hîsab

Tarîx kitabet (2 Hemazîlaxir 1425) Hîcrî (2 Temûz 2004 Mîladî)

5. FERHENGOKA BERHEMÊ

- Bedîd:** Meşhûr
Belîd: gêj, gêjok
Benat: Pirjimariya keçkê
Berzeh: Zor, zehmet
Bexîl: Xesîs
Bêxal: Kesên ku bê şa'n, xurik
Cehûl: Pirjimariya nezanan, cahilan
Cerg: Ceger
Cezîl: Pir
Duxûl: Hundirî
Efîf: sivik
Erqem: Pirjimariya reqeman û nivîsan
Esfîya: Pirjimariya şûran
Eslem: Herî silamet
Fazz û xaliz: Xweş û nexweş
Febilhemdî: Bi şikir, bi hemd
Fesîrna: Alîkariya bi lez
Fidûl: Fazîlet
Futûr: Bê wezn
Girdîgar: Xwedê
Haşif: Şûrê tûj
Hebîb: Kesên tê hezkirin
Hedîd: Hesin
Kebed: Kezab
Kesîr: Cure
Lebîb: Bi aqil
Leh: Alîgir
Leyl û nehar: Şev û roj
Medar: Debar
Mehfel: Cihê civînê
Mel'ane: Lîstika xapandinê
Melc: Stargeh
Merziyye: Ecibandî
Menzelek: Rêvekirin
Meras: Zêmar
Mezoq: Ta'm kirin
Mufessel: Bi gotinek safî, vekirî
Muhakî: Şibiyayî
Munadî: Bangkirin
Mucrîm: Sûcdar
Mudnîf: Belengaz, ze'îf
Muzirr: Bi zîrar

Mûhyî: Dayîna heyatê, îhya kirin
Mûbîn: vekirî, Fesîh
Necl: Zarok
Newa: Şînbûn
Qasir: Kesên ku bi zorê dikin
Qedîb: Fîdana terik
Qeteltû: Wî kuştibû
Qurf: Ne saxlem
Ra's: Serî
Recûl: Jêhatî
Reyb û şek: Şiphe
Rukn: Merc, esas
Rûteb: Xurme
